

BAYRAMÊ FETÎ

# ELİFSİZ



Загружено с сайта

<http://kurdistan.com.ua/>

BAYRAMÊ FETÎ

# ELÎFBA

Ji alîyê wezîriya xwendinê ya Rêspûblîka Azerbaycanê  
hatîye rastandinê

Weşîneka "Maarîf"-ê









Bakû - 1996


Bi rîdaktoriya  
Ahmedê Hepo




© "Maarif" nêşriyati, 1996.


A 4306020200-055  
M652-96 1996








A a



a .



a .




a .



a ...


V v



va . . .

av

ava



v . . . .




. . v



. . v

E e



e . e .



ev

eva

Eva ave



Eva




Eva




Eva

B b



be . a .



be ..



be .



b ....



ba

bav

Bava

Eva bave

Bava bave

Ş ş a v e b



şe

şa aş

şe baş

şes beş

şev şas



ş ..

Aşe, aşe,

Eva aşe.

Başe, başe,


Bava başe.



şe .

Ü ü

a v e b s



û ..

şû - şe      av y aş

şû - şa      şes    şûşe

Şe ü şûşe.

Bava ü bav.



. ü



. ü .

M m

a v e b s ü



me . e .

ma      maş

mû      mûm

me      ma - şe

em      Şe - mam



me.

Bava ü Şemam

Mûm ü mü.

- Şemam, eva mûme?

- Eva mûme.



m . s .

K k

â e d o a v e b ş ü m

ka keşk  
kav meşk  
mak bûk



kûv .

Meşk û keşk


Mak û bûk.

- Şemam, eva meşke?

- Eva meşke.

- Bava, eva keşke?

- Eva keşke.



kû ..



k . . . .

Ê ê

a v e b ş ü m k

mê êş  
bê mês  
vê Me - mê  
kê Şe - mê



ê . e



Memê û Şemê

ê . ek

- Memê, eva ave?

- Eva ave.

- Memê, eva mêsé?

- Eva mêsé.



ê . e

N n      a v e b ş û k ê

na	ban	aş-van
ne	man	mê-van
nan	van	şe-ne
nav	şen	Ne-nê




Nan û av. Aşvan û mêvan.

Nenê û Şemam.

- Nenê, eva nane?

- Na, Şemam, eva ne nane.



ne .



name

Î î



î .. ekan


vî	şîş	ka - nî
bî	nîk	ba - nî
mî	înî	E - mîn
bîn	şe - mî	E - mî - ne

Memê û Emîn

Emîn mî anî.


Memê ka anî.

Emîna kevanî av anî.



mî

L 1



le . . k

lê al be - lek

lêv kal e - lek

lan mal ke - la

şî - lan

Şa - mîl

Me - lek



Mala me

Mala me bal malâ Şamîle. Lê mala Şamîl  
bal aşe.


- Lêlê, Melek, Şamîl male?

- Belê, Şamîl male.



lem . e

G g



ga

ga beg ga - van

gav belg ga - mês

gem bang ge - lî

gel bal - gî gel - lek



g . ve .



gakûví


ŞAMÎLÊ GAVAN

Şamîl gavane.

Gavânê ga û gamêşane.

Şamîl gavanekî gellekî baše.

# O o



do	kon	Balo	o . e
lo	kok	Nevo	
gom	şov	Nemo	
gol	Memo	Şemo	

Şemo, Memo û Nemo      o . . an

Memo go:


- Lolo, Şemo, eva konê Şamîle?

Şemo go:


- Na, lo, eva ne konê Şamîle.

Nemo go:

- Memo, konê Şamîl bal konê Emîne.




# R r



ra	rev	mer	rûvî
rê	reş	nîv - ro	
rû	ger	ro - ava	
rûn	kêr	Re - şo	
sûr	mêr	Nû - rê	
ber	şêr	Ka - rê	ro



reşêle



Reşo

Reşo gavane. Nîvro Reşo garan anî avê.  
Ro ava bû. Reşo garan anî nava malan.

Nûrê go:

- Reşo, karî ka?

Reşo karî anî mal. Nûrê şâ bû.

## D d

da	dûr	nod
dê	dêm	der - dor
do	don	der - dan
dû	lod	Dîl - ber
dar	kod	Na - do



Nado û Dîlber

Dîka bang dan. Dîlber û Nado rabûn.  
Dîl-berê derdanek av anî, beroşek danî  
danî. Nado ardû anî. Nado go:

- Dîlber, eva danîne?

Dîlberê go:

- Erê, Nado, danîne.



## H h



hêk

ha hûr

ha - vîn

hê hêk

he - val

ho neh


he - vîr

hol meh

Ah - med

hîv deh

Meh - med



h . nar

Hêlîn û hêk

Ahmed û Mehmed hevalê hev bûn.  
Havîn bû. Her alî heşîn bû. Rêda Ahmed  
go:

- Mehmed, hêdî eva hêlîne.



Mehmed go:

- Hêlînêda hêk hene?

Ahmed go:

- Erê, hêlînêda hêk hene.

İ i



bi . in

mişk

. irî

bi

mil

hirî

şivan

di

dil

liva

bira

li

şil

kavir

bivir

min

şiv

rind

bilbil

bin

bir


bilind

bilûr


Kino bilûrvane

Biro û Kino birane. Biro şivane. Lê  
Kino bilûrvane. Kino bilûrê rind lêdide.  
Gava Kino bilûrê lêdide dilê meriva şa  
dibe.

Ç ç



çelek



cadir

ça

çar

çok

Laçîn

çê

çam

koç

Çînar



çi

çav

koçer

Çîçek

çil

çem

koçerî

Çîlê

çivîk

çol

çek

nêçîr

Colo

## ÇÎLÊ Ü COLO

Çîlê çû çêm. Colo çû çolê. Çîlê çar der-  
dan av anî. Colo çîçek anî da Çîlê. Çîlê go:

- Colo, evana çîçekê kêderêne?

Colo go:

- Evana çîçekê Laçînêne.

## S s



sêv



sol



se

se

sar

sûk

Sînê

sê

ser

sibe

Sîsê

sî

sîr

sosin

Sano

so

sal

silmask

Ûso

sor

sed

avsîr

Naso


## SÎNÊ Û SANO

Sibe bû. Sînê û Sano rabûn. Sînê çû sê elb av anî. Sînê avsîr danî ser êgir. Sano sûsa dor - bere sûrê çinî.

Sînê go:

- Sano, here heve sêv beravke. Sano se-çar sêv anî da Sînê.

## T t



ta . î



têr



tivir

ta

tane

tirşo

Temo

te

tarî

destar

Torin

tî

tavî

Terter

Tosin

tav

tevşo

Tîtal

Terê

## TÎTAL Û TEMO


Tîtal û Temo birane. Tîtal gavane, lê Temo traktorvane. Taştê şûnda Tîtal tane birne çêre. Lê Temo bi traktorê çû deştê. Ro çû ava, bû tarî. Tîtal hate mal. Bavê Tîtal got:

- Te tane anîn?
- Tîtal bersîv da:
- Erê, min tane anîn.
- Bave Tîtal got:
- Lê Temo çîma nehat?
- Tîtal got:
- Temo hê erdê şov dike.

Z z



zebeş



za      zêr      zozan      zîn

zû      zîv      kezî

zo      ez      Nazê

zar      bez      Zînê

zer      Erez      Barzanî



zerdele

## ZOZAN


Havîn bû. Gellekî germ bû. Vize-viza vizikan bû. Dê zarara got:

- Zû bikin, hazirbin, emê îro herine zozanê.

Zînê û Nazê şâ bûn. Lê Zahar got:

- Ez naçime zozanê, ezê li mal bimînim.  
 Zînê û Nazê çûne zozanê, lê Zahar ma.  
 Çendekî şûnda Zînê û Nazê Zaharra sosinê  
 zozanê şandin. Zahar zarara zembîlek  
 zerdelên zer û çend zebeş şandin.

P p



piling

pa	pal	parî	ap
pê	pel	parzûn	hesp
pî	pirr	penêr	zîpik
pîr	pîl	pispor	lepic
par	pez	pêçî	sêpê
por	poz	pirtî	serpê



pîvaz



pişik

## PÎRİK Û PERÎŞAN

Perîşan çû mala pîrikê. Pîrikê Perîşan paçkir û bire mal. Pîrikê parî nan, penêr, pîvaz û pûng danî ber Perîşanê. Perîşanê pirs kir:

- Pîrikê, eva penêrê çêlekane?

Pîrikê bersîv da:

- Na, penêrê pêze.

Perîşan panzdeh şeva li mala pîrikê ma.

Y y

1

bek

1 1


yanzdeh

ya	teyr	mey	Leylê
yan	çîya	pey	Seyran
yek	sîyar	cay	Teyran
yektî	peya	hey	Teyar

## TEYAR Û TEYRAN

Teyar û Teyran hevalin. Rokê Teyar û Teyran hespan sîyar bûn, berbi çîyan çûn.

X x



xalîce

xa	xanî	ax	Xezer
xar	xatî	berx	Xezal
xav	xûşk	çerx	Xelîl
xal	xort	Yêvlax	xaşxaşk
xalî	xebat	mexel	berxvan



xezal

XELÎL Ü XEZAL

Xelîl û Xezal xûşk û birane. Xelîl berxvan, lê Xezal xebatkare. Xûşk û bira sibê

Rêda Teyar got:

- Teyran, ev çîye?

Teyran nihêrî û bersîv da:

- Eva teyre, teyrê çîyane.

Teyar zû peya bû û berbi teyr revî.

Teyran got:

- Dest nedê, teyr birîndare.

Baskekî teyr şkestibû. Teyran teyr hêdîka hilda û anî mal. Malda Teyran baskê teyr girêda. Çendekî şûnda Teyran teyr berbi çîyan berda.

zû rabûn. Xelîl berx birne berpalê.  
 Berpal mîna xalîya rengîn bû. Xelîl  
 gellek xaşxaşk berav kir. Ro çû ava.  
 Xelîl berx anîn. Hinekî şûnda Xezal  
 hate mal. Xelîl xaşxaşk da Xezalê.

## C c



cêr

co	civat	camêr	Celîl
cî	cênûk	cimcime	Cemîle
ceh	cûcik	Gence	Cemal
cil	conî	Hecer	Celal
cêr	cîran	Azerbaycan	Casim

## CEMÎLE Û HECER


Cemîla Casim û Hecera Celîl cîranin.  
 Cemîlê û Hecerê cêr hildan çûne kanîyê.  
 Dora kanîyê pincar hêşîn bibû. Cemîlê  
 got:

- Ezê pincarê berav bikim.

Lê Hecerê got:

- Ezê cetrîyê berav bikim.

Cemîlê pincar, lê Hecerê cetrî berav kirin.



c o t

U u



gur




gul

usa	dudu	kundir	Gulê
guh	kurd	kurt	Gulnaz
nuh	kulav	kurebeşk	Gulîzer
gund	gurçik	kurmanc	Gulistan
gurz	xurcik	kuncî	Kurdistan

## GUNDÊ ME

Gundê me li berpalêye. Navê gundê me Gulistane. Du alîyê gundê me gelîne. Herdu gelîyada leme-lema çemanê. Meha gulanê çîya û banîyên gundê me bi gul-sosinava dixemilin. Li bintara gund gîha bilind dibe, dide çokê. Gîhê diçinin, dikine gurz. Derdorê gundê me daristane. Li daristanê darêن sêvan, hurmîyan, gûzan pirrin.

W w



wawîk



werdek

we

war

welat

Wezîr

wî

kew

warîs

Werdek

wê

xew

xwerin

Kewê

wêne

dew

xwendin

Cegerxwîn

## KEWÊ Û WERDEK

Kewê û Werdek xûşkin. Sibê zû ewana rabûn. Nan xwerin, çay vexwerin û çûne kewşen. Kewê deng bihîst û wêda revî. Li ber kêvir hêlîn hebû. Di hêlî-nêda çend cûcik hebûn. Kewê gazî Werdekê kir:

- Werdê, hela werê binihêre evana çine?


Werdek hat hêlînê nihêrî û got:

- Evana cûcikê kewane.


Kewê xwest cûcikan hilde. Lê Werdekê nehîst u got:

- Meriv destê xwe nadî cûcikan, ew gunene.

F f



fî.



fîl

fêz

fêkî

def

Fetî

fîno

kofî

kef

Fatê

fesal

sofî

berf

Ferîde

firo

nefî

ref


Filît

## FILÎTÊ FIRİNDEVAN

Filîtê Fetî hê zar bûnê mitale dikir: "Gelo, firinde çawa difire?" Mektebêda Filît zû-zû pirs dida dersdar:

- Meriv çawa dikare bibe firindevan?

Niha Filît îdî firindevane. Ewî xwendina bilind kuta kirîye. Firinda Filît nava Bakûyê û Yêvlaxêda difire.



firinde



jûjî



jakêt

jê	jêr	bejn	roj
jî	jîr	kejî	berroj
ji	jor	mêjû	hej
jin	jar	bajar	hejmar
jan	jagerûn	jimar	Hejar

## JİNÊN KURDAN

Jinên kurdan bi nav û dengin. Rewşa jinên kurdan kofî - kitanin. Dêhre û mêzêrên jinên kurdan mîna kulîlkê baharê reng - rengîne. Jinên kurdan him bermalî, him ji şervanin. Rojên şêr jinên kurdan ji mîran paşda namînin. Dîroka gelê meda navêñ gellek jinên mîrxas hene. Lema jî dibêjin: "Şêr şêre, çi jine, çi mîre".



quling



qaz

qaf	beq	qelî	Feqî
qat	baq	qîrş	Qero
qet	fiq	qîjîk	Qaso
qest	silq	qîçîk	Qazê
qenc	soqaq	qiravî	Qerqaş

## QAZÊ Û QASO

Qazê û Qaso xûşk û birane. Sibê zû Qazê got:

- Qaso can, here hinek qîrş beravke.

Qaso rabû qet hilda û çû daristanê. Qaso piştî qîrş û baqe kulîlkêن qîçîk berav kir. Ji dora golê qamûşek çinî. Qaso hate mal û kulîlk dane Qazê. Qazê got:

- Zehf razîme, Qaso can. Lê ev qamûşa bona çîye?

Qaso bersîv da:

- Ezê ji qamûş xwera fiqê çekim.

## ELÎFBA

A a	Â â	Î î	Ĵ ĵ	S s	Ş ş
B b	Ç ç	J j	ڇ ڇ	Şş	ڙ ڙ
C c	C c	K k	K k	T t	T t
Ç ç	Ç ç	L l	L l	U u	U u
D d	D d	M m	M m	Û û	Û û
E e	E e	N n	N n	V v	V v
Ê ê	Ê ê	O o	O o	W w	W w
F f	F f	P p	P p	X x	X x
G g	G g	Q q	Q q	Y y	Y y
H h	H h	R r	R r	Z z	Z z
İ i	İ i				

## EM KÎNE?

Em kurdin. Dîroka kurdan çar hezar salan zêdetire. Li dunyayê 25 mîlyona zêdetir kurd dijîn. Welate kurdan Kurdistan. Çar dewlata Kurdistan di nava xweda par - parî kirine. Lema jî kurd li Kurdistanê bindest û kolene. Kurd li Kurdistanê nikarin bi zimanê dê bixwînin.

Gellek serkarê kurdan avîtine zîndañan. Lê kuştin û zêrandin kurdan natirsîne. Kurd şerkarîya xwe pêşda dibin. Wextê bê kurdê bibine xwedanê welatê xwe.

## EM KURDÎN

Em kurdin,  
Eslê şêranin,  
Yek hêjayî  
Sed mîranin!  
Em kurdin,  
Kurdên mîrxasin,  
Welatê xwe  
Yek dixwezin!  
Em kurdin,  
Kurdê nav û deng,  
Bona welat  
Tim dîkin ceng!

*Bayramê Fetî*

## ZİMANÊ KURDÎ


Bi xemil, rewşe,  
Şirîn û xweše,  
Zimanê kurdî.

Beyta Feqîye,  
Sewta Xanîye,  
Zimanê kurdî.

Bi nexş, awaze,  
Letîf û naze,  
Zimanê kurdî.

Şûrê şêrane,  
Nûra erşane,  
Zimanê kurdî.

*Şikoyê Hesen*



## KURDISTANIM KA

Bax û bostanim ka,  
Ax, gulistanim ka.  
Dijmin tev girtin ax,  
Ax, Kurdistanim ka.

Em anîn cihan wê,  
Em kirin însan wê,  
Lê me zû ew berda,  
Ax, Kurdistanim ka.

Geşt û seyranim çûn,  
Heyran xanim çûn,  
Çavêm li qurbanet ma,  
Ax, Kurdistanim ka.

*Cegerxwîn*

Min ceger tev bû xwîn,  
Bê xwendin û zanîn,  
Bê tac û bê kesra,  
Ax, Kurdistanim ka.

*Cegerxwîn*

## TEYRÊ WELATHÎZ

Rojekê nêçîrvanek diçe neçîrê. Dinihêre li kêleka kevirekî teyrek ketîye û nikare bifire. Nêçîrvan teyr hildide, dinihêre baskê wî şkestîye. Ew teyr tîne mal, baskê wî girêdide, jêra qefesekê çêdike.

Nêçîrvan bona xwerinê çiqas tiştên rind hene dide ber teyr. Lê teyr dîsa razî namîne dibeje: "Ax, welat, wax, welat".

Nêçîrvan teyr dibe li cîyê, ku hildabû berdide. Teyr berbi çiya difire û dibêje: "Oxweş, welat, oxweş, welat".

Welat şîrîne ji hemûya




## AZERBAYCAN

Êl dizane tu ya minî,  
Cî - warê min, dunya minî,  
Welatê min, dîya minî,  
Tuyî minra him ruh, him can  
Azerbaycan, Azerbaycan!

Tu minra dê, ez tera zar,  
Ewlad bê dê nave tu car,  
Kuda herim nakim sitar,  
Dîsa minra hewar tuyî,  
Roj û rozgar, cî - war tuyî!

Semed Vütxün



## BAKÛ

Navê rêsپublîka me Azerbaycane. Bakû serbajarê Azerbaycanêye. Ev bajarê bedew û mezin li rex bera Xezerêye. Fabrik û karxanê Azerbaycanêye here mezin li bajarê Bakûyêne.

Navê Bakûyê çawa bajarê niftê li dunyayê eyane. Li Bakûyê gellek mekteb, înstîtût, têatr, mûzey hene.

Bakûyêda azerbaycanî, rûs, kurd, tatar, lezgî, taliş, tat û wekîlên gellek miletên mayîn dijîn. Ev mileta-na mîna neferên malekê dijîn û tevayî kar dikin.

## AZERBAYCANÊRA

Li dilê min tu qudretî,  
Nûr - şemala dinê ketî,  
Tu gulustan, tu cineti,  
Azerbaycan, Azerbaycan!

Pembû, nifta te zêrê zer,  
Rewşa teye bedew Xezer,  
Li te zevî, rez bûne behr,  
Azerbaycan, Azerbaycan!

Dunya - alem tev dizane,  
Kurd, azerî du birane,  
Bextewarin, bi te şane,  
Azerbaycan, Azerbaycan!

*Egitê Qadî*

## Q E R E B A X

Azerbaycanêda gellek cî - warên bedew hene. Yek ji wana Qerebaxe. Qerebaxêda bax û baxçe zehfin. Lema jî wêra dibêjin Qerebax, yanî "gellek bax".

Bax û baxçê Qerebaxê reng-rengîne. Meha gulânê deşt û zozan, bax û baxçê Qerebaxê mîna xalî-xalîça dixemilin.

Dîrokêda gellek caran neyaran çav kutane Qerebaxê. Lê her car xwestina wana di cavêن wanda maye. Bona azakirina Qerebaxê êpêce xortêن kurdan jî şehîd bûne. Navêن wan xortan di dilêن meda timê dijîn û wê heta-hetê bijîn.

## SÄLEKÊDA ÇEND MEH HENE?

Roj û şev pey hev têن û diçin. Her rojeke derbazbûyî emrê me 24 seheta zêde dike. Lê emrê mirova rojava na, salava tê jimarê. Lema jî dibêjin: "Tu çend salîyî?"

Salekêda 12 meh hene. Navêن wan evin: çileyê paşîn (yanvar), sibat (fêvral), adar (mart), nîsan (aprêl), gu-lan (may), hezîran (îyûn), tîrmeh (îyûl), tebax (avgûst), îlon (sêntyabr), cirîya pêşîn (oktyabr), cirîya paşîn (noyabr), çileyê pêşîn (dêkabr).

## TÊDERXİSTİNOK

Sêsid şêst pênc reşêle,  
Donzdeh ga, du çêlek,  
Nîvî reşin, nîvî belek.  
Ew ciye?

## ROZGARÊ NSALÊ

Çar rozgarê salê hene: bahar, havîn, payîz, zivistan. Her rozgarek sê mehin. Adar, nîsan, gulân mehîn baharêne. Hezîran, tîrmeh û tebax mehîn havînêne. Mehîn payîzê evin: îlon, cirîya pêşîn, cirîya paşîn. Zivistan jî sê meha dikişîne: çileyê pêşîn, çileyê paşîn û sibat.

Baharê her alî hêşîn dibe. Bax û baxçê bi kulîlkên spî, gevez, qîçik û sûtva dixemilin. Roj hêdî-hêdî direj dibin.

Havînê kulîkên bax û baxçan dibine rez. Hewa gellekî germ dibe. Payîzê roj hêdî-hêdî kin dibil. Zû-zû baran dibare, ba tê, belgên dâran diweşin.

Zivistanê dibe ba û bager, deşt û zozan bin berfêda dimînin.

Sal mîna bawîşka têñ u diçin


## QULİNG

We li hewa girtîye rêze,  
Per vedidin jor û fêze,  
Li esmana tev digerin,  
Ser çiyara weldigerin

Hûn xerîbin û dilxedar,  
Xweşe bona we her bahar.  
Hîvîya wene gul-gulîstan  
Deşt û zozan, mîrg û çîman.

Hîvîya wene gul û rihan,  
Werêñ li wan bibine mîvan.  
Ez dibêjim bi ruh û can,  
Pirskin halê Feqîyê Teyran.

*Feqîyê Teyran*



## KURÊ BÊ XÎRET

Mêrekî kal hebû. Îdî kar pê nedibû. Rojekê kurê wî kalî jê bêzar bû. Kur bavê xwe kire sebetekê û bir danî serê çiyakî, ku gur bixwun. Wextê kur ew danî erdê û zivirî here mal kalê got:

- Lawo, te ez anîme vira, ew şuxulê teye, lê sebeta xwe hilde bive mal, wê rojekê lazimî tebe.

Kur pirsî:

- Bavo, sebetê bona ci lazimî minbe?

Kalê got:

- Tu kal bunê kurê teyê jî te pê bîne vê derê.  
Kur poşman bû û bavê xwe hilda anî mal.

Kur hene - gula bavê xwe,  
Kur jî hene - kula bavê xwe.

## NEWROZ

Newroz sersala meye,  
Edet û ola meye.  
Biçûk û mezinê me  
Dibêjin îdî deme.  
Diçine sersala hev,  
Diçine li mäla hev.  
Sersala kurdan pîroz,  
Ewe cejna me Newroz.

*Qadîn Can*



## PADŞAHÊ ZULMKAR Û KALİK

Padşahekî zulmkar hebû. Wî padşahî xwîna gellek merivan rêtibû. Vizekan zû-zû wîra vir-viz dikirin û digotin: "Filankes pey te xeber dide". Padşah wî lezî ew meriv dida kuştinê.

Rojekê kalekî pey padşah gazinî û got: "Padşah gellekî zulmkare". Vizekan hê gilî û gazinê kalê padşah-ra negotibûn. Kalê xwe rabû çû hizûra padşah.

Padşah kalêra got:

- Te çima pey minra gazin kirine?

Kalê bersîva padşah da:

- Min pey te her çi gotîye, ya rast gotîye. Çima ne raste, wekî tu zulmê didî gel?

Padşah ji gilîyên kalêyî rast şâşîya xwe fehm kir û got:

- Kalê xelatkin, bila here mala xwe.

*Nîzamî Gencevî*

Rastan zewal, xaran kemal tune.

## ŞÊR Û MİŞK

Lana şêr û qulka mişk rex hev bûn. Şêr usa qure-qure diçû-dihat, qe binê pîyê xwe nedinihêri. Rojekê wextê şêr hat derbazbe here, mişk kete nava lepê wî. Şêr xwest mişk bihincirîne, mişk got:

- Min azake, ezê rojekê kêrî te bêm.

Vê demê bû pirqe-pirqa şêr kenîya. Usa kenîya, wekî çok lê sist bûn, mişk ji nava lepê wî derket revî.

Çendekî şûnda nêzîkî qulka mişk zarîna şêr hat. Mişk bi tirs serê xwe derxist û nihêri. Nihêri, mîna nexweşê heft sala zare-zara şere. Mişk nêzîk çû, dît ku şêr ketîye dava nêçîrvan. Mişk pirsî:

- Şêro, birako, ci bûye?

- Ez ketime davê, - şêr bi posîde-posîde bersîv da.

- Qe belengaz nebe,- mişk got,- eze te xilazkim.

Mişk kindirê davê bi diranê xweva qut-qutî kir. Şêr dava pîyê xwe kevirekî xist, dav hûr-hûrî bû. Şêr aza bû.

Wê şûnda herro şêr hatinê jî, çûnê jî serê xwe mişkra berjêr dikir.

Yek-yeke, dudu-komeke.

## ÇİMA BİNDESTİN?

Mad, kardox kurdin,  
Mêrxas û merdin...

Quretî berdin,  
Çima bindestin?

Derdê me giran,  
Welat bû talan.  
Serbestî - derman...  
Çima bindestin?

Xebathiz, karkar,  
Şorişvan, şerkar,  
Gellkin serkar,  
Çima bindestin?

Hevra şer kirin,  
Nan, av jehr kirin,  
Em hev nagirin -  
Lema bindestin!

*Adîlê Cemal*

## ÇÎYAYÊ SÊ SALE

Carekê du heval rêda diçin. Ji wan hevala yek li wan  
deran nas bûye, lê yê dinê na. Ewana rêva çiyakî mezin  
dibînin. Ew merivê nenas pirs dike:

- Navê vî çiyayî çiye?

Hevalê wî dibêje:

- Navê vî çiyayî Sêsaleye.

Hevalê nenas ecêbmayî dimîne u dibeje:

- Pah! Xwedê emir nedê, wekî bibe çar sale wê çiqasî  
bilindbe?"

Merivê nezan - mîna korane

## KEÇ - BÛKÊN KURDAN

Pişt bi kemerin,  
Sol bi qonderin,  
Guh bi guharin,  
Keç - bûkên kurdan.

Tûncik temorî,  
Qırık bi morî,  
Kenê şekirî,  
Keç - bûkên kurdan.

Zend bi bazinin,  
Gulin, sosinin,  
Xecê û Zînin,  
Keç - bûkên kurdan.

Koff bi zêrin,  
Kortik mexmerin,  
Ser mil bi cêrin,  
Keç - bûkên kurdan.

*Qadrê Motî*

## CÎRANTÎ

Maleke dewletî hebûye. Rojekê xweyê malê jina xwera dibêje:

- Van cîrana ebûra me birine. Çiyê wan kême, têni ji medixwezin. Werê em ji vira barkin, herin cîkî dûr, bila kesek li dora me tunebe.

Jina wî dibêje:

- Tu rast dibêjî. Ez qaîlim, rabe em barkin. Ewana bardikin û diçin...

Rojeke payîzê mîrik gênim dadigre, wekî here êş. Ew gazî jinê dike:

- Ca bjûnê bîne, devê çewala bidrûm.

Jina wî malê digere - nagere bjûnê nabîne û tê mîrê xwera dibêje:

- Bjûna me unda bûye.

- Unda bûye, here ji mala cîranekî bîne.

- Ka cîranê me, mîrik?

Wê şûnda ewana mala xwe bar dikan û têne cîyê xweyî berê.

Cîranê nêzîk ji birayê dûr çêtire

## ÇIVÎK Û TORA NÊCÎRVAN

Nêcîrvan li dora golê bona çivîkan dafikek danîbû. Bi toreke zehf mezin gellek çivîk girtibûn. Lê ew çivîkana ewqas pirr bûn ku, wan tor jî bi xwera kaşkirin û firîyan. Nêcîrvan jî li pey wan revîya û xwest, ku wan

bigire. Ew di rêda rastî cotkarekî hat. Cotkar jê pirsî:

- Tu kuda dibezi? Qe tu bawer dikî, ku tê bikaribî wan bigirî?

Nêcîrvan bersîv da:

- Eger di hundurê wê torêda tenê çivîkek hebûya, min nikaribû ew bigirta. Lê ezê niha wan bigirin.

Rastî jî wek gotina nêcîrvan bû. Dema bû êvar, her yek ji wan çivîkên di torêda, xwest ku vegere hêlîna xwe. Her yekî tor berbi alîyê xwe kişand. Gişk westîyan û bi torêva li erdê ketin û usa man. Nêcîrvan jî hat û yek bi yek ew girtin.

*Lêv Tolstoy*

## XORT Û KALÊ

Carekê xortek gayê wî barkirî pêşîyê rêda diçû. Kalek rast hat, xort pirsî:

- Apo tu nizanî ezê zû bighîjime malê?

Kalê got:

- Kurê min, wekî tu hêdî-hêdî bajoy tê zû bighîjî malê, wekî tu zû-zû bajoy tê dereng herî malê.

Xort guh neda gilîyên kalê, gayê xwe ajot jê derbaz bû, lezand zû bighîje mal. Rêva ga teqîya. Kalê gihîstê, dît gayê xort teqîyaye. Xort got:

- Kalê, lema te digot zû-zû bajoy tê dereng bighîji malê? Dunya bi sebrê avaye.

## DİLÊ BAVÊ

Rojeke zivistanê xortek derketibû derva, berfa ber dêrî paqîş dikir. Bavê wî çiqasî gotê "sare, werê hundur", kur gura bavê nekir. Lema jî bavê xort çû nevîyê xwe pêçekêda anî, danî ser berfê. Xort ev yek dît, bi lez çû kurê xwe hilda û got:

-Bavo, tu çi dikî? Ne ewê bicemide.

Xort kurê xwe hilda u bire mal. Bavê xort got:

- Lawo, dinihêrî, ew kurê teye, dilê te lê dişewite. Ne tu jî kurê minî. Dilê min ji bona te dişewite.

Bav - piştâ kurane

## MÎR ÜNÊÇÎRVAN

Rojekê mîrê Botan bi cend sîyarava der-ketibû gerê. Ewana nêzîkî çiyakî bilind bûn. Mîr nihêrî, ku xortek li ber kevirekî mezin rûniştiye. Mîr jî xort pirsî:

- Xortê delal, tu li ber vî kevirî çi dikî?
- Ez nêçîrvanim.
- Lê tifinga te kanê?
- Kewê min heye.
- Çawa, tuyê bi kewê kewan bigrî?
- Min dav li dora wî çêkirîye. Kewê min wê bike qive-qiv, kewê bêñ û bikevine davê, ezê wan bigrim.

Mîr şûrê xwe derxist û kew kerî-kerî kir û gote hevalên xwe:

- Ew kesê, ku heval û hogirê xwe bi destê xwe dike dava dijmin ez hiz nakim. Heqê wî kesî tenê koştine.

Kî gorê hevalara vedide - xwe dikevê

d  
d  
x  
le  
  
Apoyev Bayram Feti oğlu

ƏLİFBÄ

(kürd dilində)

Redaktoru H. Ə. Rüstəmov  
rê  
Rəssamları A. A. Ələkbərov, S. A. Şatikov  
xc  
Bədii redaktoru A. M. Hüseynova  
pi  
Texniki redaktoru T. Ə. Rzali  
Korrektörleri Z. M. Ələsgərova, T. Feti  
Yıgilmağa verilmiş 9.07.96. Çapa imzalanmış 13.08.1996. Kağız formatı 60x90<sup>1/16</sup>. Ədəbi  
qarmitur. Ofset çapı. Fiziki və şərti ç. v. 4,0. Şərti rəng-ottisk 4,19. Uçot nəşr. vərəqi 4,7.  
Tirajı 2000. Sifariş N 295. Pulsuz.  
Azerbaycan Respublikası Mətbuat və İnformasiya Nazirliyinin "Maarif" nəşriyyatı, Bakı-  
370111, Ə.Tağızadə küçəsi, N 4.  
Azerbaycan Respublikası Mətbuat və İnformasiya Nazirliyinin "Qızıl Şərq" icarə mətbəəsi.  
Bakı, H. Aslanov küçəsi, N 80.